
ÖIF-Kursên dê û bavan: Ji bo rêberî û piştgirîya di warê pergala dibistanan a Awisturyayê de

Dibistana havînê anku „Sommerschule“, ku cara pêşî di 2020'an de ji aliyê Wezaretê Perwerdehiyê ve hatibû destpêkirin, ewê di betlaneya havînê ya 2021'an de jî berdevam bike. Fona Întegrasyonê ya Awisturyayê anku Österreichische Integrationsfonds (ÖIF) tevî dibistanên havînê 2021'an de dîsa kurseke ji bo dê û bavan û wasîyan pêşkêş dike, ku zarokên wan di dibistana havînê de beşdar dibin. ÖIF- Kursên dê û bavan, ku sê seatî ne, zanyarî û rêberîyê didin, him di warê pergala perwerdehiyê ya li Awisturyayê de û him jî ji bo serkeftina zarokên we ya di dibistanê de.

ÖIF- Kursên dê û bavan di navbera 17'ê Gulanê û 10'ê Îlonê de pêk tên û li seranserî Awisturyayê tên li dar xistin. Kurs ewê ji aliyê hindekarên xwedî bawername yê ÖIF ve werin dayîn. Heger hewce be wergerên ÖIF jî ewê tê de beşdar bin. Ev derfet ji bo hemû beşdaran bêmûçe ye.

Di kursên dê û bavan de hûnê li ser van mijaran agahîyan werbigirin...

- Dibistana havînê ya 2021'an (wekî naverok, armanc, şans),
- Bingehên pergala perwerdehî û dibistanê ya Awisturyayê,
- Derfetên din ên perwerdehiya pîşeyî û xwendinê ji bo ciwanan piştî dibistanê (wekî ezmûna derçûnê, nasandina navendên şewirmendîyê yê li herêma),
- Girîngiya hevkarîya digel dê û bav û wasîyan di warê sibêroja pîşeyî ya zarokên we de (wekî xwendina mecbûrî, karîgerîyên civînên dê û bavan, têgihiştin û danûstendinên avakar ên digel pedagogan, bikaranîna Schoolfox),
- Derfetên piştgirî û alîkarîyê yê ji bo zarok û ciwanan (wekî di warê zehmetîyên di hînbûnê de, amadekarîyên ji bo destpêkirina dibistanê, alîkarîya ji bo zimanê Almanî) herweha
- Derfetên hînbûna Almanî yê ji bo dê û bav û wasîyan.

Beşdarî

Da ku hûn di van kursan de beşdar bibin, ji kerema rasterast serî rêvebirîya dibistanê bikin.
